

Zimanê Kurdî, Zimanê şêrîn

Rêberê Silvî

Dema pirs a zimanê Kurdî tê meydanê, navê rewşenbîr û zanyarên mezin û payebilind, ku di warê ziman û



toreya Kurdî de ew xwedî berhem û rol in û ji gelê xwe re bûne sembol û nîşan, mîna Seydayê **Cezerî**, **Mele Ehmedê Xanî**, **Nalî**, **Manî**, **Feqê Teyran**, **Malbata Bedirxaniyan**, **Nûredîn Zaza**, **Osman Sebrî**, **Qedrî Can**, **Cigerxwîn**, **Qenatê Kurdo**, **Mele Ehmedê Namî**, **Hejar**, **Hemze Begê Muksî** ...û gelekên dîtir têne bîra mirov.

Navê van torevan, helbestvan û zanyarên me yên bi rûmet tê bîra me, ji ber ku wan xebateke mizîna bê hemta ji bo parastin û pêşvebirina ziman û wêjeya Kurdî kirine, afrandin û dahênanên xwe yên nîrxdar pê nivîsandine û ew ji me re hiştine, herweha, ji ber ku bi saya serê wan lehengên nemir, me ziman, çand û folklor a xwe parastîye, bi serbilindî û bextiyarî em bi zimanê xwe yê zikmakî dipeyivin, pê dixwînin û dinivîsin. Li seranserî welêt û li derveyî sînorên wî jî, ango li mişextî û derbederiyê, îro, bi hezaran keç, xort, mêr û jinên Kurdan bi coş û hestîne germ, bi zimanê Kurdî yê şêrîn helbest, gotar, roman û hemî reng û cureyên toreyê dinivîsin, ew ji ber zimanê

xwe yê ciwan û delal fedî nakin. Ma çawa ewê ji zimanê **Cezerî** yan jî ji yê **Xanî** fedî bikin ku îro berhemên wan yên bi vî zimanî hatine nivîsandin, li cîhana wîjeyî bê mînak û temtêl in?!.. Ew zimanê bendkirî ku bi dirêjahiya sedsalan bi her hawî şerê hebûna wî bûye û hê jî dibe, wî li ber xwe daye, berevaniyeke rew a serkeftî di ber hebûna xwe de kiriye û ji gelên cîhanê bi tevayî re teqez kiriye û daye zanîn ku ew zimanekî sax û pêdar e, rehên xwe di xaka welêt û dilê gelê Kurd de kûr û dûr berdane, tu hêz, tu kîn û tu zikreşî, nikare vî zimanî bihejîne yan wî ji holê rake.

Gotin, peyv, metelok, çîrok û çîvanok, stran, dîlok, lawik û heyranok, li kêleka wan jî pirtûk, destan, kovarên Kevin mîna **Hawar**, **Roja Nû** û **Ronahî** yê... h.w.d, ew hemî îro ji gelê me re pêma û sermiyanine dewlemend û zengîn in, herweha ew mak û jêdera jîn û vejîna torey a Kurdî ne. Pêwîst e nîfşê me yê nû, keç û xortên me yên nûhatî, bi Kurdbûna xwe şanaz û serfiraz bin û bi zimanê xwe yê Kurdî jî payebilind bin, ew xwe hînî xwendin û nivîsandina pê bikin û ji ava wan kaniyên torey a Kurdî a Kevin a resen tê vexun û bidin ser şopa wan comerdên ku ji me re bûne stêrkine geş û rêya pêşveçûnê li ber me dûz û ronî kirine.

Rêz û hurmeta me ya giran ji hemî zimanên gelan re heye, ji ber ku **D.R.(11)**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de